Bîranîa Yilmz Gûney

Reşoyê Pîrê

Di sala 1937 an de, li navçeya Edenê, gundê **Yenece**, Y. Gûney ji dayîk dibe. Bavê wî, Ehmed[1], Kurdekî Zaza, ji Siwêrekê ye. Di zaroktiya xwe de, ji ber şerê êlan goçeberî Edenê dibe . Diya wî, Gulê, ji êleke Kurdên deşta Mûşê ye û malbata wê jî, ji ber şerê cîhanê yê yekem guçeberî Edenê dibin.

Y. Gûney, di zaroktiya xwe de, weke hemî zarokên belengaz yên Rojhilata Navîn, di ber xwendina xwe re, pir karan dike. Karê çandiniyê, berdestê goştfiroş û H.W.D . Bavê wî dixwaze bixwîne daku, bibe katibê ser qabana pemboyê. Lê Y. Gûney, dibêje : **Min tiştekî din dixwast, lê min nizanîbû** ew tişt çi ye ".

Y. G çêroka xwe ya yekemîn, ya li ser şerê gundiyan, sala 1952 an, di kovara "Birgûn" de diweşîne . Di wê demê de, pêrgî hin kesên sosyalîst tê û hişyariya wî ya siyasî dest pê dike. Di sal 1955 an de, nivîsarên xwe bi şêwakî vekirî diweşîne. Ji ber wan nivîsaran, ji hêla karbidestên Tirk ve, bi piropanganda komonîstan tê gunehkar kirin . Û heft sal û nîvan zîndan û sal û nîvek surgunî didinê- Gunehkariya wî ji ber peyvek li ser zimanê jinekê, di çêrokek wî de weha hatibû " **Ewê rojek dawiya we bê** " -. Di dû re, ew ceza sivik dibe, dibe salû nîvek zîndan û şeş heyvan surgunî Qoniyê dikin. Rojên surguniya wî ya li Qoniyê, di jiyana Y . G de, qonaqeke girîng bû ..

Di sala 1958 an de, derfeta herî pêwîst, di jiyan Y. G de, bi riya derhinêrê Tirk, Atif Yilmaz bi dest dixwe. Di nivîsandina sînaroya Filmê wî yê bi navê (Gurên vî welatî)de beşdar dibe û di derhinêrê de, dibe cîger û weke lîstevanekî jî, di wî Filmî de dilîze. Ji ber wê jî, deriyên dadgehê lê vedibin . Di sala 1969 an de, dadgeh cezaya dawî didiyê . Y xwe ji ber wê cezayî dide alî û dev ji xwendina aborî ya zanîngeha Stembolê berdide. Sala 1961 an, 18 heyvan di girtîgehê de radikeve. Di girtîgehê de, romana xwe ya pêşîn û dawî ya bi navê " **Ew stûxwar Mirin** " dinivîse . Ew roman, xelata Kemal Orhan, di sala 1972 de werdigre. Di sal 1963 an, di dezgeheke filman de dixebite, li bajaran digere, filaman raberî xwediyên sîneman dike. Di wê demê de, çend çêrok û sîneryoyên filman dinivîse. Û di 5 salan de, di bêtirî 60 filmî de weke lîstavan dilîze. Di sal 1968 an de, berpirsiyarê dezgehê pê dihese, ji kar derdixe û jêre dibêje " **Cihê komonîstan li ba min tune ye** " . Di sala 1972 an de, Y . G ji ber piştgirî û xwedîkirina hin xwendekarên şoreşger, yên ji ber destlata Tirk direvin tê girtin. Piştî derketina wî ji zîndanê bi çend heftan sala 1974 an, Y. G bi kuştina dadgehvanekî Tirk **D.R(5)**